Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 415 nameronahi@gmail.com 18 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Koçerî xweşe li zozanê Artemêtê





*Zozanên Serhedê bi her sal hembêza xwe ji koçer, şivan û bêrîvanan re vedike. Lê ji ber qedexeyên dewleta Tirk weke berê gel bi azad nikarin herin zozanên xwe. Koçerên Zozanên Artemêtê ya Wanê diyar kirin koçerî karek zehmet e lê xweş e.*

Malbata Demîr ku 20 salin li Zozanê Artemêtê ya Wanê nêzî 500 mih û bizinan xwedi dike, bi şîr û penêrê wan debara xwe dike.
Malbata Demîr a li zozanê Arteméta Wanê 20 salin koçeriye dikin, debara xwe bi şîr, mast û penêrê mih û bizinan dikin. Malbata Demîr ku ji Sêrtê ye, nêzî 20 salin di demsala bihar, havîn û payizê de pezê xwe tînin zozanan debarê bi şîrê pez dikin. Malbata Demîr nêzî 500 mih û bizinan xwedî dikin û bi şîrê wan debarê dikin. Malbata Demîr her roj pez didoşin û şîrê wî dikin mast, penêr û li bajar difiroşin. Di salên dawî de ji ber zozan hatine qedexekirin li nêzî bajar pezê xwe xwedî dikin. Malbata Demîr di 20 salên dawî de li Wanê bi cih bûne û dema hewa germ dibe û berf dihele pezê xwe derdixin zozanan. Şivan û Bêrîvan rojê carekê pez didin bêrî û şîrê wî didoşin. 5 jinên Bêrîvan bi hevre pez didoşin û piştî şîr dotin, dikin mast û penêr û roja din dibin li bajarê Wanê difiroşin. Her roj saet di 11.00'an de jinên Bêrîvan pez didin bêrî û şîrê wî didoşin.

**20 SALIN BÊRÎVAN IN**

Bêrîvana 55 salî Ayşe Demîr ku xwediya pez e diyar kir ku berê diçûn zozanên Xîzan, Feraşîn û Elbakê, zozan bi zozan digeriyan. Demîr anî ziman ku di 20 salên dawî de hatine li Wanê bi cih bûne û di demsalên bIhar, havîn û payizê de derdikevin zozanan. Demîr, diyar kir ku hevserê wê şivaniyê dike û ew jî berîvaniyê dike û bi şîrê pez debara malbatê dikin. Demîr, anî ziman ku ji şîr mast û penêr çê dikin û sal 12 meh şev û roj bi sewalan re xewtê xwe derbas dikin. Demîr, destnîşan kir ku berê diçûn deşt û zozanên Elbak, Feraşin û Xîzanê, lê piştî ev zozan hatin qedexekirin êdî leşker destûr nadin biçin zozanan. Demir, anî ziman ku debara wan li ser sewalkariyê ye û nikarin bê sewalan bijîn û wiha got: "Em niha bi pez debara xwe dikin. Em ne hewceyê kesî ne. Ger ku dewlet destûr bide em ê niha biçin zozanên bilind. 2 mehin em li vir in. Em lîtreya şîr bi 5 lîre, kiloya penêr bi 16 lîre difiroşin."
Bêrîvan Rewşan Yucel jî diyar kir ku karekî zor û zahmet e, lê kareki azad û xweş e. Yucel anî ziman ku 27 salin koceriyê dike, 200 mihan didoşe...*MA*


# Rewşa koçberên Kampa Minbicê zehmet e





Koçberên bajarê Minbicê ji ber zêdebûna germahiyê zehmetiyên mezin dikişînin. Koçberan bang li rêxistinên mirovî kirin ku alîkariya wan bikin.
Li kampa Minbicê ya li gundê Resim El-Exder 780 malbatên ku ji ber hovîtiya çekdaran û hêzên rêjîmê reviyane hatine bicihkirin. Li kampê 5 hezar û 250 kes hene. Pirraniya wan ji bajarokên Meskene, El-Xefse û El-Mehdûm û gundewarên Dêr Hafir yê ku dikeve başûrê Minbicê ne.
Bi zêdebûna germahiyê û ji ber tunebûna ceyran û ne bûna alavên sarkirinê koçber gelek zehmetiyan dikişînin. Rêveberiya Kampê bi derfetên xwe yên heyî hewl dide pirsgirêka koçberan çareser bike û pêdiviyên wan bi cih bîne.
Koçbera bi navê Xedîce Zêdan El-Timê ku dayîka 4 zarokan e, ji gundên Dêr Hafir a Helebê ye, beriya sal û nîvekê ji ber şerên di navbera rêjîmê û DAIŞ'ê de reviya û li li kampê bi cih bû. Xedîce li ser rewşa wan a li kampê ev tişt anî ziman: "germ zêde bû û li ba me tu amûrek sarkirinê tune ye. Zarokên me herî zêde ji germahiya bandor dibin." Xedîceyê bang li rêxistinên Mirovî kir da ku alîkariya wan û zarokên wan bikin.
Koçbera bi navê Zeyneb El-Hesen ya ji Helebê jî wiha got: "Germahiya zêde buye û konên me kevinbûne û ji hev ketine. Av li kampê kêm e, ji bo peydakirina wê, em li tabûra depoya avê pir dimînin".
Zeynep jî bang li rêxistinên mafên mirovan û Rêxistinên navdewletî kir ku alîkariya wan bikin.
Koçberê bi navê Ferec El-Xelef bavê 5 zarokan e, ew jî ji Helebê koçber bûye û di kampê de bi cih bû ye. Ferec ji ber astengdariyê nikare bimeşe û wiha got: "Ez her tim di bin konê de dimînim. Ji ber germahiya zêde zehmetiyê dikişînim. Zarokên min bi zikêşê ketine û ji ber tunebûna bijîşkan û ber astengiya min ez nikarim wan ji bo dermankirinê bibim derveyî kampê."
Endama Rêveberiya Kampê Îmam Mistefa diyar kir ku ew bi derfetên xwe yên bi sînor hewl didin avê ji koçberan re peyde bikin û got: "Konên koçberan ji ber hawaya zêde ji hev ketine em hewl didn ji wan re konên nû û amûrên sarkirinê ku bi enerjiya tavê dixebitin peyda bikin."...*ANHA*

## Rêber Apo planên qirkirinê têk bir



Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû derbarê tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de axivî û diyar kir ku rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi avakirina PKK'ê re planên qirkirinê, planên tinekirina Kurdan ên dewleta Tirk ji hev xist. Ji ber vê yekê tolê ji Rêber Apo hiltînin."
Karasû wiha axivî, "Dewleta Tirk hemû derfetên xwe ji bo tinekirina têkoşîna 35 salan a bi pêşengiya PKK'ê bi kar tîne. Bêguman wê tecrîd û zexteke giran li Rêber Apo bike. Kiryarên taybet yên şexsekî li dijî Rêber Apo tên bikaranîn. Rêber Apo bîst sal in li dijî vê yekê li ber xwe dide. Çawa ku li derve li êrîş li dijî têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd tê kirin, zext û zordarî heye, li dijî Rêber Apo jî heman zext û êrîş hene." ***R-4***

## Xwîna Welat wê li erdê nemîne



Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG'ê Fermandarê HPG'ê yê Eyaleta Xerzanê Welat Gever bi bîr anî, ji malbata wî û gelê Kurdistanê re sersaxî xwest. Fermandariya NPG'ê got, "Weke hevrêyên têkoşînê, mîna hevrêyên xwe yên din ên şehîd em ê hevrêyê xwe Welat jî ji bîr nekin û soza tekoşîna xwe ya heybet dubare dikin. Xwîna hevrêyê me Welat wê li erdê nemîne."***R-5***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 415 18- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

**14'ê Tîrmeh'ê Rojiya Mirinê a Mezin**



*Zekî BEDRAN* ***R-4***

# ÇARESERÎ SÛRIYEKE DEMOKRATÎK E

Sêyemîn Kongreya Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê bi beşdariya bi dehan delegeyên ji Sûriyê û welatên derve hat lidarxistin. Di kongreyê de çareseriya aloziya Sûriyê û her wiha rola MSD'ê ya di pêşeroja Sûriyê de hat nirxandin û di derbarê demokratîkbûna Sûriyê de projeyên çareseriyê hatin pêşkêşkirin.



## DIVÊ SÎSTEMEKE NE NAVENDÎ WERE AVAKIRIN

Sêyemîn Kongreya MSD'ê bi dirûşma "Ber bi çareserkirina siyasî û avakirina Sûriya nenavendî ya demokratîk ve" bi beşdarbûna 270 delegeyan, bi beşdariya mêvanên ji tevahiya Sûriyê, her wiha şandeyên ji Ewropa û Misrê hat lidarxistin. Hevserokatiya MSD'ê di kongreya xwe ya sêyemîn de nêrîna xwe ya siyasî eşkere kir û pêşniyar kir ku aloziya Sûriyê bi sîstema nenavendî ya demokratîk, parastina yekbûna xaka Sûriyê, dikare were çareser kirin.

## DIVÊ PROJEYA DEMOKRATÎK WERE ERÊKIRIN

Di bendên çareseriyê de wiha tê gotin: "Divê ji bo pêşeroja Sûriyê projeya demokratîk were erêkirin. Ji bo çareseriya pirsgirêkan û aloziyê divê rêbaza aştiyane û demokratîk esas were girtin. Demokrasî rêya çareserkirina pirsgirêkên netewî û mezhebî ye. Ev yek jî li welatê me ku bi pirrengiya xwe tê naskirin, heye. Çaresererî di Sûriyeke ne navendî de ye. Destûra ku were avakirin divê Sûriyeke ne navendî armanc bike." ***R-4***

## Kilîta çareseriyê Netewa Demokratîk e



Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê li navçeya Til Hemîsê ya li herêma Cizîrê bi gel re civînek lidar xist. Di civînê de yek ji rêveberên TEV-DEM`ê Mediya Mihemed li ser rewşa Sûriyê axivî û got, "Gelên bakurê Sûriyê planên hêzên ku dixwestin şerê mezhebî û netewperestî derxînin, têk birin. Kilîta çareseriya pirsgirêkan Netewa Demokratîk û biratiya gelan e." ***R-2***

## Em ê heta dawiyê li ser rêya Ocalan bimeşin



Endama Desteya Niştimanî ya Ereb Hiweyda El-Nedas tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û got, "Em weke jinên ji neteweya Ereb bi alikariya Rêveberiya xweser îro gihiştin vê astê. Jin îro bi saya Ocalan bi roleke mezin radibin. Em ê heta dawiyê li ser rêya Ocalan bimeşin." ***R-3***

## Doktoran ji bo Şehbayê bang kir



Welatiyên Efrînê yên li ku ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk li Şehbayê bi cih bûne di nava şert û mercên zehmet de dijîn û têkoşîna xwe berdewam dikin. Ji ber kêmbûna dermanan û xizmeta tendurustiyê bi nexweşiyan re rû bi rû dimînin. Rêveberên nexweşxaneya Avrîn ji bo alîkariyê bang li rêxistinên mirovî kirin. ***R-6***

## Koma dawî ya YPG'ê ji Minbicê vekişiya



Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ragihand, koma şêwirmend a dawî ya YPG'ê ya li Minbicê peywira xwe temam kiriye û roja 15'ê Tîrmehê bi temamî ji Minbicê vekişiyaye. Meclîsa Leşkerî ji bo piştgiriya wan spasiya YPG'ê û Koalîsyona Navdewletî kir. ***R-5***

## Efrîn ne Bab û ne Îdlib e



Ji rêveberên Partiya Demokratîk a Kurd a Sûriyê PDKS'ê Remzî Şêxmûs diyar kir ku lidarxistina konferansa rizgarkirina Efrînê gaveke dîrokî bû got, "Em ê Efrînê rizgar bikin. Efrîn ne Bab û ne jî Îdlibe. Ji bilî Efrîniyan wê kes nikaribe Efrînê bi rêve bibe." ***R-4***

## Koçberan an vedigerînin an jî dikujin



Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan HRW, daxuyaniyek da û ragihand ku rayedarên Tirk li gelek deveran penaberên ji Sûriyê tên nema qeyd dikin. HRW'ê da xuyakirin ku Tirkiyê di nava sê salan de deriyên xwe yên sînorê bi Sûriyê re girtiye û hêzên li ser sînor jî bê pirs Sûriyeyiyên hewl didin ji sînor derbas bibin vedigerînin, dikujin û birîndar dikin." ***R-2***

## Dagirker li Efrînê malan dişewitînin



Artêşa Tirk û çeteyên xwe li Efrînê bê navber wêranî û hilweşandinê didomînin. Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li navenda navçeya Mabata ya Efrînê agir berdan malên sivîlan. Hat ragihandin ku dagirkeran roja 16'ê mehê zêdeyî 15 malên sivîlan şewitandin. ***R-2***

## Gêrîla derbên giran li dagirkeran dixe



Li herêma Biradostê ya başûrê Kurdistanê çalakiyên gêrîlayên HPG'ê li dijî artêşa Tirk a dagirker berdewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir, 15'ê Tîrmehê li Biradostê di çalakiya gerîla de 8 leşkerên Tirk hatine kuştin. Hat ragihandin di encama êrîşa artêşa tirk li ser gundê Bostînê yê herêma Biradostê zarokek hatiye kuştin. ***R-2***

# Koçberan an vedigerînin an jî dikujin

***Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan HRW, daxuyaniyek da û ragihand ku rayedarên Tirk li gelek deveran penaberên ji Sûriyê tên nema qeyd dikin. HRW'ê da xuyakirin ku Tirkiyê di nava sê salan de deriyên xwe yên sînorê bi Sûriyê re girtiye û hêzên li ser sînor jî bê pirs Sûriyeyiyên hewl didin ji sînor derbas bibin vedigerînin, dikujin û birîndar dikin."***



HRW'ê diyar kir ku Tirkiye nema penaberên ji Sûriyê qeyd dikin û got, "Hêzên Tirkiyê yên li ser sînor Sûriyeyiyên hewl didin ji sînor derbas bibin vedigerînin, dikujin û birîndar dikin."

Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan (Human Rîghts Watch -HRW) daxuyaniyek da û ragihand ku rayedarên Tirk li gelek deveran penaberên ji Sûriyê tên nema qeyd dikin.

Di daxuyaniyê de hate gotin, Tirkiye li Stenbolê û li neh bajarên li ser sînor nema Sûriyeyiyan qeyd dike. HRW'ê diyar kir ku wê ev yek rê li ber dersînorkirina bi awayekî nehiqûqî, vegerandina bi darê zorê û bêparhiştina ji xizmetên tenduristî û perwerdeyê veke.

Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku Komîsyona Ewropayê roja 29'ê Hezîranê biryar dabû ku nîvê alîkariya ji 3 milyar Euroyî di çarçoveya peymana koçberan de ji bo destekkirina penaberên li Tirkiyê bişîne Tirkiyê.

HRW'ê da xuyakirin ku Tirkiyê di nava sê salan de deriyên xwe yên sînorê bi Sûriyê re girtiye û hêzên li ser sînor jî bê pirs Sûriyeyiyên hewl didin ji sînor derbas bibin vedigerînin, dikujin û birîndar dikin."

## Kilîta çareseriyê Netewa Demokratîk e



Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê li navçeya Til Hemîsê ya li herêma Cizîrê bi armanca nirxandina rewşa dawî civînek lidar xist. Şêniyên navçeyê, şêx û rûspiyên herêmê her wiha endamên meclîsa bajarokan beşdarî civînê bûn.

Civîn li navedna Çand û Huner a navçeyê hate lidarxistin. Di civînê de yek ji rêveberên TEV-DEM`ê Mediya Mihemed li ser rewşa siyasî li Sûriyê axivî. Medya diyar kir ku her kes ji bo berjewndiyên xwe şer dike û ew hêzan tevlîheviyê di nava pêkhateyên herêmê de çêdikin.

Mediya diyar kir ku ji beriya 5 hezar sal gelê herêmê li ser esasê mezheb û ol şerê hev dikin û ev tişt anî ziman,"Gelê Kurd û gelê Bakurê Sûriyê hemû pirsgirêkên mezhebî, şovenîst û netewî bi bin xistin. Li şûna wan biratiya gelan di nava hemû pêkhateyên herêmê de ava kir."

Mediya di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker ji dagirkirina Efrînê ew e ku projeya netewa demokratîk têk bibe û tevlîheviyê di navbera gelê herêmê de çêbike û wiha dewam kir, "Nikarîbûn armancên xwe pêk bînin. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li hember komkujiyên siyasî li Efrînê sekinî. Berxwedan li Efrînê didome."

Medya li ser siyaseta gelê Bakurê Sûriyê wiha axivî, "Siyaseta me ku em hevgirtina gelê Sûriyê ji nûve ava bikin. Pêwîste gelê Bakurê Sûriyê û Sûriyê bi giştî Idlib, Efrîn, Cerablus û Ezazê ji dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê rizgar bikin."

Di dawiyê de Medya diyar kir tekoşîna gelê Kurd ne tenê ji bo avakirina statuyeke Kurdî yan Erebî ye lê belê avakirina statuyekê ku hemû pêkhateyan digre nava xwe û wiha dawî li axaftina xwe anî, "Di Rojhilata Navîn de gelek dozên ji bo çareserkirinê hene lê kilîta wan netewa demokratîk û biratiya gelan e."…*ANHA*

## Gêrîla derbên giran li dagirkeran dixe



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir, 15'ê Tîrmehê li Biradostê di çalakiya gerîla de 8 leşkerên Tirk hatine kuştin.

Li gorî daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê, roja 15'ê Tîrmehê li herêma Biradostê ji du baskan ve çalakiyek hatiye kirin û di encamê de 8 leşker hatine kuştin. Hate gotin, artêşa Tirk êrîş biriye ser gundê Bosine û zarokek kuştiye.

Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ya li ser mijarê wiha ye:

Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de, 15'ê Tîrmehê saet 18:30'î li dijî artêşa TC a dagirker a li ser girê Lêlîkanê yê li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê çalakiyek li dar xistin. Ji du baskan ve derbên giran li çeper û stargehên dijmin ên li ser gir hatin xistin. Bi qasî ku hate zelalkirin, 8 leşkerên dijmin di çalakiyê de hatin kuştin. Artêşa TC a dagirker piştre obus û hawan avêt Lêlîkanê û derdora gundê Bosine. Ji ber êrîşa artêşa Tirk a li ser gundê Bosine, zarokekî bi navê Mihemmed Marîf jiyana xwe ji dest da.

## Jinên ku endamên DAÎŞ'ê ne hatin girtin




Li Reqayê komeke jin a endamên çeteya DAÎŞ'ê hatin girtin.

Bûroya Çapemeniyê ya Hêzên Ewlehiya Navxwe ya Reqayê daxuyaniyek da û got Hêzên Ewlehiyê yên Jinan ên Navxwe komeke jin a endamên çeteya DAÎŞ'ê hatine girtin.

Di daxuyaniyê de hate gotin, ''Beriya bi çendekê Hêzên Ewlehiyê yên Jinan komeke jin a ku ji bo DAÎŞ'ê xebatên îstîxbarî dikirin, destgîr kirine.''

Bi berdewamî hate gotin, ''Hin derdoran girtina kesên navborî xwestine ji bo berjeweniyên siyasî bikaranîn û êlên herêmê ji bo vê mijarê tehrîk bikin. Lê hewldanên wan bi ser neketine.''

Diyar bû ku dosyaya jinên ku hatine girtin ji yekîneyên Dada Civakî re hatine şandin.

## Dagirker li Efrînê malan dişewitînin



Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li navenda navçeya Mabata ya Efrînê agir berda malên sivîlan.

Li gorî agahiyên ku ji şêniyên navçeya Mabata ya Efrînê hatin girtin, dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê roja 16'ê mehê di saet di 16:00'an de agir berdan malên sivîlan.Çavkaniyan destnîşan kirin ku Hêzên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ji aliyê başûrê navçeyê ango ji Geliya Cafer ve agir berdan malên welatiyan. Çavkaniyan gotin ku zêdeyî 15 malên sivîlan şewitîn.

## Bomberana hêzên rêjîmê dewam dike



Bomebarana hewayî li ser herêma sêgoşeya mirinê didome. Hêzên rêjîmê bajarokê El-Hîta û Zemrîn xistin bin serweriya xwe. Her wiha beşa yekem ji koçberên Der'a yê gihiştin keleha El-Medîqa ku wê ji wê derê berê xwe bidin bakurê Sûriyê.

Li gorî Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê li herêma sêgoşeya mirinê topbarana hewayî û êrîşên bi fuzeyan didomin. Balafirên şer ji şeva Yekşemê ve bi qazanên teqemenî êrîşî bajarokên Eqreba, El-Mal, Tel El-Mal û Tel El-Hara yên bakurê rojavayê parêzgeha Der'a yê dikin. Her wiha şer û pevçûn di navbera komên çekdar û hêzên rêjîmê de li derdora bajarokê El-Teyha didomin.

Hêzên rêjîmê bajarokê El-Teyha xistin bin serwriya xwe. Niha jî li derdora bajarokê El-Mal şer û pevçûn hene. Hêzên rêjîmê bajarokê Zemrîn ê dikeve herêma sêgoşeya mirinê û her wiha aliyê bakurê rojavayê Der'a yê xistin bin serwriya xwe.

Li gorî navendê roja Yekşemê beşa yekem ji koçberên Der'a yê û gundewarên wê gihiştin keleha El-Medîq a bakurê rojavayê Hemayê. Li wê derê guhertin tê kirin da ku ji wê derê berê xwe bidin bakurê Sûriyê.



# Hozanê lawikê Serhedê

***Hozan serhed, bi navê xwe yê rast Silêman Alpdogan di 12'ê Tîrmehê sala 1999'an li zozanê Fereşînê bi rengekî hêsîr ket destê dijmin û hat şehîd xistin. Hozan Serhed bi afrîneriya mûzîka xwe rengekî nû da stranên Kurdî. Stranên wî yên weke Hewlêr, Mizgîna Leheng, Payîze heta roja îro jî li ser zimana ye.***

**Delîl MÎRSAZ**



Her kes vê rastiyê dizane kû çavkaniya ava jiyanê ji quntarên çiyayên welatê min dixulxule û kêlî bi kêlî û gav bi gav bi xwe re tovên jiyaneke geş dipişkivîne,vê rastiyê hîn bi hemo wateya peyvê li ser sînga welatê min rengê xwe wenda nekiriye û gurr jî diherike. Em hîn dikarin bêjin:di dinyaya kû dêwan daqurtandî de,hêşta dayîka min di ber hûrkirina pîvazekê re destek girî dike. Hîn jî li ser bênderên gundê me canî cot cot dibezin û bi zayîna mihekê,şivan sê berxika ber hemêza xwe dike tîne gund û hîn jî mirîşkên malî hêkên du zerikî dikin. Dinya jî dizane kû awazê jiyana mirovan bi lorîkên dayka min hatin hûnandin,çawa îlam û kirmaşan bûn maka hore û awzên çemerî,pawe û tawêle û biyare û pesarên çiyayê şinirwê jî bûn dergûşa hewar û siyaçemaneyên hawramiyan,quntarên çiyayê agirî jî dibin warê kalandina lawik û kilamên dengbêjiyê. Li vêderê bi dehan dengbêjên weke Şakro bi dengên xwe yên çiyayî û bi hestên xwe yên nazik stran û lawikên kû qehremanî û biserhatiyên vî welatî di hundirê xwe de dihewandin,dikalîn. Van deveran dîroka bi hezaran sal zulm û stema dagirkeriyê kişandin û li hember wê li ber xwe dan,van lawik û stranan jî ev dîroka qehreman ya bi êş dinav hev de di hundirê xwe de xudî kirin û heta roja îro anîn. Bê guman dema em behsa dengbêjiyê dikin,bilindiya çiyayê agirî xwe derdixe pêşya çavên me. Li vê devera resen,li ber dengê bilûra şivanan û şinge şînga zengilê pezê kû dihat bêriyê û xulxula meşka dayka min re,li welatê serheda destanek ji dayîk dibe. Ev destan lawikê serheda hozan Serhed e, ev lawik weke hemû lawikan ji dayîk nabe,ev lawik aşiq ji dayîk dibe. Ev lawikê aşiq di zarokatya xwe de kela eşqa tembûrê jiyan dike,lewra jî dayîka wî neçar dibe bi perê tevdîra xarina zivistanê jêre tembûrekê bikire. Dibêjin ev lawikê aşiq di demeke gelek kurt de bi tembûrê re dihele û rihê xwe û tembûrê dinav hev de dihûnîne,li ciyê kû lê dixwîne jî mamoste matmayî dimînin û li ber fêmkirina eşqa vî lawkî bê çare dimînin. Ev lawik ji bo bibe hozan Serhed eşqa tembûrê û meydana huner û hunermendê heyî jî wî têr nakin. Wî hest dikir kû di warê huner û hunermendiyê de xelekek windayî heye,hest û wîjdanê wî ew neçar kirin kû ew li dû wê xeleka windayî bigere. Hozan Serhed her çiqas kû di warê hunerî de gelek pêş dikeve û di zemîna huner û hunermendan de ciyekî wî yê ber bi çav çêdibe jî,lê ew nikare bayê popîlîzmê bipejirîne û pêlî hest û wîjdanê xwe bike,lewra ew xeleka windayî li ber eşqa xwe asteng dibîne. Bê guman gera li dû xeleka windayî wisa rihet nabe û şîrove kirin û fêmkirina wê jî wisa hesan nabe,çima hesan nabe? Ji ber kû hozan bi xwe li welatê qedexeyan de mezin bû. Heta dighêje rastiya wê xelekê û hinekî fêm dike kû ew xelek stranên kû di qirikan de bûne kul û hişk û ziwa bûne,êşa welatekî dagirkirî,civaka hatiye perçiqandin û qedexe kirin e.

Sal derbas dibin,eşqa hozan Serhed kû wî neçar dike her dinav lêgerînê de be, bi wî dide fêm kirin kû hunermendên civaka bindest erkên wan zêdene û barê wan girane. Dinav vê yekê de dibîne kû li welatê wî rastiyeke kû hatiye berûvajî kirin heye,ji ber kû hestên wî nazikin û wîjdanê wî zindî ye nikare vê rasyiyê paş guh bixe û weke hunermendê sexte kû wê demê xwe xistibûn rojeva bazarê ji nedîtîve bê. Ji bo hozan Serhed bighêje xeleka windayî weke dîtina serok jêre dibe şans ta mirov dikare binav bike. Dîtina serok ta dihêle, nakokiyên kû di hundirê wî de dijîn derdixe zanebûnê. Nakokiya herî mezin jî eve kû ew bi xwe xelkê welatekî resene lê nikare bi zimanê dayika xwe bi saza xwe re hestên xwe par veke. Dema kû li ser vê yekê lêdikole dibîne kû dewleta tirk bi her awayî çand û hunera welatê wî perçiqandî û bi awayekî berfere ji bo asîmle kirin û ji xwe xerîb kirina kurda polotîka xistiye dewrê. Di nava vê polotîkayê de kesên kû dewletê bi xwe ew kirine hunermend û derxistine piyasê,yên weke nûrî sesi gûzel-mehmûd tuncer-îzet altin mêşe-îbrahîm tatlîses û bi sedan kesên din dinava vê hemleya berfere ya asîmle kirina kurdan de cî girtibûn û li dijî gelê xwe bûne maşeya destê dewletê. Fêmkirina van rastiyên bi êş meşa hozan Serhed û lêgerîna wî ya li xeleka windayî xorttir dike. Li vêderê hozan fêm dike kû eşq gihiştina astê xwe helandina dinava armancê de ye,dema aşiq dinava armanca xwe de xwe dihelîne û pêre dibe yek,wê demê aşiq azadî û nemiriyê bi dest dixîne. Bê guman eger ev rastî rastiya kesekî be,di cîhana me ya îro de bi awakî xazayî li derveyî tevgera azadî û bîrdoziya rêber Apo cî jêre nînin. Hozan Serhed bi vê encamê tevlî tekoşîna azadya kurdistanê dibe û di rêya şehîd Sefqan û şehîd Mizgîn û Delîl doxanan de ket rêza xebatê. Ji bo cara yekem jêre derfeta tomarkirina straneke kurdî çêbûbû digot: ez careke din ji dayîk bûm. Bê guman ew li akademya Masom korikmaz demekê ma û dewreyeke perwerdê li wir dît û bi şanseke mezin karîbû ji nêzîk ve bi rêber Apo re bikeve nav gotobêjên li ser çand û hunerê. Bi van gotobêjan hozan Serhed,di lêgerîna xeleka windayî de dighêje despêka çareserya qetandina wê xelekê û bi wê ferasetê dikeve nav qonaxa çareseryê. Hozan Serhed piştî akadîmya Masom korikmaz derbasî awropa dibe û dinava koma berxwedan de xebatê dike. Li wêderê cara yekem strana (emê çêkin) bi zimanê kurdî di kasêta koma berxwedan de tomar dike. Bê guman bandora wî li ser koma berxwedan ciyekî çêdike,ji ber kû wî di astê zanyariya mûzîkê de bi awayekî akadîmîk xwe bi pêş xistibû. Hozan Serhed li kuderê dibû bila biba her kesî li ser mûzîkê aqil jê digirt.

Cara yekem zivistana 1996 li bajarê silêmanyê li navenda çanda mezopotomya min hozan serhed dît,li gel şehîd çiya bi hevre ji hewlêrê hatibûn. Heval Çiya berpirsyarê Giştî yê xebata me ya çandê bû,dema kû me nîqaş kir,dinava nîqaşan de hozan serhed pêşniyar kir kû ew li navenda silêmanyê bimîne,di serî de min wate nedayê kû çima dixaze li silêmanyê kar bike,piştî kû demekê em bi hevre man û me hev nas kir, min dît kû di heval Serhed de eşqeke lêgerînê ya naskirina zaravayên kurdî heye. Silêmanyê soranin û nêzîkê wê hem hewramî hene û hem jî kelhur hene,lewra xwest li silêmanyê bimîne. Dema kû li awropa bû bi zaravayê dumilkî hinek stran gotibûn û li wir rastî hunermendên soran hatibû,dixwest li ser zaravayê soranî jî hinekî kar bike û bi rastî jî tavilê ket nav xebatê û gelek zû xwe li gel hunermendên wêderê adebte kir û hezkirina derdûra xwe qazanc kir. Li ser mijara kû çima dixwest li ser zaravayên kurdî lêhûrbûnê çêke,wisa digot:dewletên dagirker li ser çand û hunera me gelekî xebitîne û xwestine me asîmle bikin,di pila yekem de dewleta tirk pirojeyên mezin ji bo vê yekê çêkirine û heta asteke bilind jî em weke kurdên bakurê kurdistanê ji çand û hunera xwe xerîb kirine,girêdayî vê yekê kurdên kurmanc yên perçê din yên kurdistanê jî para xwe ya xerîb bûnê têra xwe girtine. Ji bo vê yekê naskirina zaravayên kurdî hem ji bo yekîtya netewî û hem jî ji bo vegera li ser koka xwe wê roleke mezin bibîne Li başûrê kurdistanê nêzî du salan me bi hevre kar kir,hozan Serhed gelek taybetmendiyên wî yên bedew hebûn, ji berî her tiştî gelekî dil nizim bû û li her civatê jî xwe dixist dilê mirovan. Ji zarokan gelekî hezdikir û ji pera aciz bû. Herdem rû li ken û gotinxweş bû. Di wê dema kû em bi hevre man de,me gelek berhem jî bi hev re çêkirin,yek ji wan berhema kilîpa(hewar)bû kû me bi zaravayê soranî amade kiribû. Ev kilîp di dîroka tekoşîna me de yekem kilîp bû kû li çiyayên kurdistanê bi gêrîla re bê çêkirin. Her wisa strana hewlêr kû hozan bi xwe yekbû ji yên li ser awazê wê xebitî û pê hat naskirin. Bê guman dinava xebatê de gelek bîranîn jî me bi hev re derbaz kirin. Hozan serhed hunereke zindî ye,wê di dilê gelê kurd û mirovatî de her zindî jî bimîne.

## Koma Mexmûrê li Rojava şanoyan pêşkêş dike



Koma Şanoyê ya Wargeha Mexmûr, tûra şano li Rojavayê Kurdistanê berdewam dike. Endama Komê Nûdem Yeman diyar kir ku ew ji jiyana Netewa Demokratîk bandor bûn, wê hevalên wan perwerdeya şano bibînin.

Di 6'ê mehê de Koma Şano ya Hêvî û Yekta ku ji 15 ciwanên Wargeha Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) pêk tê derbasî Rojavayê Kurdistanê bûn. Armanca komê li Rojavayê Kurdistanê şanoyan pêşkêş bikin. Komê hetanî niha li Kobanê û Dirbesiyê şano ya bi navê "Lêgerîna Heqîqetê" peşkeş kiriye û wê li gorî derfetan li bajarên din jî şanoyê pêşkêş bikin.

Koma Hêvî û Yekta li bajarê Qamişlo, Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo şano pêşkêş kir. Naveroka şanoya "Lêgerîna Heqîqetê" li ser gundek Bakurê Kurdistanê ku di bin polîtîkayên dewleta Tirk a dagirker de tê helandin û bi rêya çeteyên olî tê parçekirin dike mijara xwe.

Ji endamên komê Nûdem Yeman diyar kir ku wan xwest çanda ku li Mexmûr fêrbûyîn bigihînin Rojavayê Kurdistanê û got: "Şoreşa Rojava hest da me. Em dizanin gelê Rojava pir êş kişandine, hema saetek be jî em dixwazin dilê dayîkan geş bikin."

Yeman anî ziman ku tişta herî bala wan kişandî perwerde û jiyana Netewa Demokratîk a li Rojava bû.

## Mîhrîcan bi şevbêrkê rengîn bû



Di çarçoveya rêzeçalakiyên Mîhrîcana Duyemîn a 19'ê Tîrmehê de şevbêrkeke stranan hate lidarxistin. Gelê Kobanê bi nêzikbûna 19'ê Tîrmehê, salvegera Şoreşa Rojava, rêzeçlakî dane destpêkirin.

Di çarçoveya rêzeçlakiyên Duyemîn Mîhrîcana 19'ê Tîrmehê de şevbêrkeke stranan li parka 19'ê Tîrmehê ji aliyê Navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xidove hate lidarxistin.

Cihê çalakiyê bi pankartên "Şoreşa 19'ê Tîrmehê rêgezên şovenîzma partiya Baasê şikand" hatibûn xemlandin.

Bi sedan şêniyên kantonê, hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Şahoz Hesen, Serokê Desteya Têkiliyên Derve ya Kantona Cizîrê Ebdulkerîm Omer û Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kantona Kobanê Enwer Muslim amade bûn.

Di çalakiyê de endamên Çand û Hunerê stranên gelêrî û şoreşgerî pêşkeş kirin.

Her wiha helbestên Kurdî yên dîrokî hatin xwendin…*ANHA*

# Doktoran ji bo Şehbayê bang kir

***Welatiyên Efrînê yên li ku ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk li Şehbayê bi cih bûne di nava şert û mercên zehmet de dijîn û têkoşîna xwe berdewam dikin. Ji ber kêmbûna dermanan û xizmeta tendurustiyê bi nexweşiyan re rû bi rû dimînin. Rêveberên nexweşxaneya Avrîn ji bo alîkariyê bang li rêxistinên mirovî kirin.***





Ji ber kêmbûna derman û alavên tendrûstiyê yên pêwîst, hejmara mirin û nexweşan li nav welatiyên Efrînê yên li Şehbayê de zêde dibin. Rêveberên nexweşxaneya Avrîn bang li rêxistin û aliyên têkildar kirin ku ji bo rêgirtina li ber mirinan, alav û pêdiviyên pêwîst ji wan re peyda bikin.
Komîteyên tendrûstiyê yên girêdayî Heyva Sor a Kurd li Şehbayê bi derfetên kêm ji bo şêniyên Efrînê bi erkên xwe radibin. Nexweşxaneya Avrîn û gelek navendên tendrûstiyê li herêmê û navçeyên Şehbayê vekirin.
Ji ber dorpêçkirina Şehbayê, komîteyên tendrûstiyê nikarin derman û pêwîstiyên tendurustî ji bo dermankirina nexweşan derbasî kantonê bikin û nikarin nexweşan jî derxînin derveyî herêmê. Bi vê yekê metirsiyên zêdebûna mirinan zêde dibe.
Endamê Rêveber a nexweşxaneya Avrîn a navçeya Fafînê Mihemed Şêxo, diyar kir ku ji ber dagikirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirk a dagirker û komkujiyên ku li Efrînê li dijî sivîlan pêk anî, şêniyên Efrînê neçar man ji malên xwe derkevin û li kantona Şehbayê bi cih bibin.
Şêxo destnîşan kir ku ji ber dorpêçkirina Şehbayê gelek astengiyan dikşînin û hin nexweşiyan ji ber kêm derfetan û kêmbûna dermanan, nikarin derman bikin, lewra gelek nexweş jiyana xwe ji dest didin.
Şêxo wiha dewam kir,"Pêwîstiya gelek nexweşan bi derketina derveyî Şehbayê heye. Pêwîstiya 30 nexweşên penceşêrê bi dermankirina lezgîn hene, 450 nexweş li hêviya erêkirina derkertina derveyî herêmê ne."
Şêxo di dawiyê de bang li rêxistinên mafên mirovan kir ku serdana Şehbayê bikin, rewşa zehmet a şêniyên Efrînê bi çavên xwe bibînin û alîkariya wan bikin ji bo ku rê li ber mirinan were girtin…*ANHA*



## Guhertina nexşeya mejiyê cîhanê, 14'ê Temmûzê

Medeni FERHO

Qêrîna Xwedawendê Dembuz ji gelî û newalên Kurdistan û cîhanê olan vedide.
Dîrok û mirov di klîmatên cografya Kurdistanê de hatibûn bêdeng kirin. Dembuz û Înanna, Xwedawendên klîmatên cografya Kurdistanê ne.
Lê dijminê Kurdan, neynika droka Kurdan şikandibûn, Kurd kiribûne riyeke winda. Di vê riya winda de ziman, dîrok û kultur hatibûn qedexe kirin. Cografya hebû, nav qedexe bû. Stran di dîlan û govend hebûn, lê suwariyên kuheylanan, di kozikên herivtî de hatibûn fetisandin.Toza mirinê hatibû bela kirin û demjiyana fetsînok hatibû afirandin. Cografya di nava netirsiyê de, tirs bela dikir. Despotîzm û barbarî, 2 cendirme bûn, qanun bûn.
Tora tunekirinê hatibû hunandin û destîniya gelê Kurd, wek xencera her du aliyên wê tuj, bedena Kurd hêdî hêdî dikuşt. Bedena Kurd bêyî ku biçê şer, dibin zext û zora "planên islahatê" û qanunên red û înkarê de, di ber şibaqa qesetureyên cendirmeyan de, wek berfa li ber germa kîm-kîma Havînî diheliya. Qedexe û qanun, ji şûr û topan dijwartir bûn.
Barana bi xwelyek kujerî bi ser cografya Kurdistanê de dibariya.
Di vê rewşa kambax de; mêjiyê ku jiyana giştî, kişûmat civak, bi hest, hewn û hişmendî kire nava haraketê derkete holê. Mêjiyê serdemê Ocalan bû, têkoşerên li Zindana Amedê bûn. Di herka dîrokê de bûne Dembûz, bûne Inanna, îro kişûmat Kurd in!... Ev navê dîroka bû ye!...
Îro, qîrana Xwedawend Dembuz û Înanna, di çar klîmatêûn salê de, li çar aliyên Kurdistan û cîhanê olan vedide.
Dembûz û Temûz û Tîrmeh... Ev destpêka herka çemê dîroka nû ye!...
Sal 1980ê û faşîzma 12ê Îlonê xwest ku harka dîroka nû bidê rawestandin; ji nû de cografya û bedena Kurd "fetîh" bike... Arêna tunekirinê jî Zindana Amedê bû. Di dîroka Kurdan de, her serhildan, di zîndanan de hatiye fetisandin û bedena Kurd li çarmixê dane. Bi mêjiyê serdemê, li Zindana Amedê, hevîrekî nû yê dîrokê hate haveyn kirin û li deşt û newal û geliyên cografya Kurdistanê, bi dengê Xwewend Dembûz û Înanna bû olanek cîhanşimûlî. Lewma meha Dembuz-Temmuz-Tîmehê, bû meha guhertina nexşeya mêjiyên cîhanê. Bêguman ev dîrok, di çarçoveya med-cezîra bûyeran de, bi gelek berdêlên giranbiha hate bidestxistin. Dîse jî em dibînin ku, di vê mehê de stêrikên ezmanên Kurdistanê cûda diçirisin, heyva kevanî û heyva li çardehan cûda ronahiyê didin. Êdî zarokên ku navê lehengên destanê 14ê Tirmehê li wan, hatiye kirin, dikarin li pey keskesora ezman bibêzin. Ev meha ku Ehriman ji xaka Kurdistanê direvê ye. Klîmatên cografya Kurdistanê bûne hêlîna Sîmûr û zarokên rojê, wek Rastemî Zal, ji vê hêlînê şiyar dibin. Li hemberî barbariya dijminê ku di çar demsalan de û di hemû klîmatan de, cografya Kurdistanê dikirin çolîstan, qîran didin.
Dembuz û Înanna yên hemdemî, dînazorên wek DAIŞê, wek hêzên dewşirme, berteref dikin.Cîhan li hemberî zarokên Ehriman, DAIŞê neçar bûn. Lê, zarokên Dembûz û Înanna, li hespên dîrokê, li kêştiyên ezmanî suwar bûn û di arêna dîrokê de, rûmeta mirovahiyê parastin. Ev serketina rûmetdarî, berhemê du tiştan e; yek mêjiyê sedsalê, du lehengên destanî yên Zindana Amedê û heval û hogirên di rîtma dîroka nû de meşiyan e. 14ê Dembuzê -Temmuzê-Tîrmehê, destpêka vê serketina hemû dem û heyaman e. Ev dem û heyamên dijwar, bûne felsefeya dîrokê. Divê baş werê nirxandin û baş werê fêm kirin. Dijminê Kurdan, dîrok di baxçeyê nijadperestiya di nava çar dîwaran de dîl girtine. Lê Haraketa Azadiya Kurd ev dîwar hêrivandin. Wateya 14ê Dembuzî-Temmuz-Tirmehê ev e.Kurd, dîroka mezin û rast dinîvîsin, divê Kurd ji formulekirin, vegotina û xwendina vê dîrokê netirsin.

## 19'ê Tîrmehê bû asoyeke nû




Buroya Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê bi dirûşmeya "Şoreşa 19'ê Tîrmehê asoyeke nû li pêş gelê me vekir" semînerek da.
Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê (P.D.K.S) bi nêzîkbûna salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê, li bajaroka Pêndir a Kobanê semînereke organîze kir.
Semîner li dibistanekê bi amadebûna bi dehan kesî hate dayîn.
Semîner ji aliyê endamên Komîteya Navendî ya partiyê Nîhad Ehmed û Mustefa Ebdî ve hate dayîn.
Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê Mustefa Ebdî girîngiya roja 19'ê Tîrmehê şîrove kir û got, "Em salavgera Şoreşa 19'ê Tîrmehê pêşwazî dikin û pîroz dikin. Di wê rojê de çirûska şoreşê ji Kobanê de dest pê kir û li Rojava belav bû û bi îlankirina Rêveberiya Xweser bi encam bû."
Ebdî got, " Şoreşa 19'ê Tîrmehê bû tîrêj û şewqa xwe da jiyanê."
Nîhad Ehmed jî anî ziman ku bi şoreşa 19'ê Tîrmehê gelek gav hatin avêtin û wiha got," Ew şoreşa ji bo me bû weke lingekî ku em li ser disekinin, 19' ê Tîrmehê bû bingeha rêxistinbûyînê û avakirina civakeke demokratîk."

## Şoreşa Rojava



Faruk SAKIK

Dem dema "Bihara Gelan" bû.
Di destpêkê de, di sala 2010an de li Tûnisê destpê kir, li Misir û Lîbyayê dewam kir, bandora xwe li Sûriyê jî kir.
Gelên ku li van dewletan dijiyan derketin qadan û êdî ji rejîmê dictator yên demdirêj hesab dipirsîn.
Şoreşa gel a Sûriyê jî di 26ê Çileya sala 2011an de destpêkir. Dengê, bihara gelan ya li herêmên din destpêkiribû vê carê li ser axa Sûrî bilind dibû.
Di 15ê Adara sala 2011an de, li gelemperiya welêt şer belav bû.
Pêvajoya ku li herêmê destpê kir, bandore xwe li Rojavayê Kurdistanê jî kir. Kurdan di destpêka şerê li Suryê ji xwera xeta 3'emîn bijartibûn.
Û ji bo avakirina xweseriya demokratîk ketibûn nav hewldanan. Sazî dihatin avakirin û ji bo şoreşek amedekarî dihatin kirin. Lê berî vê yekê jî di warê siyasî û leşkerî de bi rêxistin dibûn.
Di demek wiha de li gel biryardariya xwe ya beşdariya şoreşê, Kurdan li dijî nêzîkatiyên rejîm û mûxalîfan, ji bo yekitiya xwe ya siyasî ava bikin ketin nav hewldanan û Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) û Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê (MGRK) ava kirin.
Di warê siyasî de ev rewş hebû. TEV-DEM di nav liv û tevgeran de bû. Ev bahara gelên Sûryê dabûn destpêkirin Kurdê bi çi rengî tevlî bibin û Kurd dikarin di vê demê de çi bikin li ser vê yekê nîqaşan destpêkiribû. Destpêkirina serîhildana gel a li dijî rejîma Sûriyê, ji bo gelê Kurd firsendek afirandibû. TEV-DEM dixwest ku têkoşîna xwe derxîne asteke bilindtir.
Bi pêvajoya şoreşê re tevgera Kurd biryar da bi awayekî çalak beşdarî şoreşê bibe.
EWROJ....
Dema 19ê Tîrmehê nêzdibû êdî Kurdan didîtin dem hatiye. Hin bûyer jî wek teqînên li Şamê û hewldanên êrîşên artêşê yên herêmên Kurdistan Kurdan neçardikir ku şoreşa xwe destnîşan bikin.
Roja 18ê Tîrmehê, di dema civîna krîzê ya li paytexta Sûriyê Şamê bi beşdariya payebilindên hemû saziyên bi bandor ên rejîmê de, teqînekê rû da û di encamê de beşeke mezin a payebilindên rêveberiya rejîmê mirin.
Êvara 19ê Tîrmehê jî Artêşa Azad a Sûriyê (AAS) bajarên Minbci û Cerablûs ên navbera Kobanê û Helebê de bi dest xist û berbi Kobanê di meşiyan.
Van bûyeran lez dan xebatên Kurdan ji bo derbasî qonaxa sêyemîn bibin.
Kurdan diviya li vê derê biryar bidana ku vê êrîşa berbi Kurdistanê bidin rawestandin. Û wisa kirin di 19ê Tîrmehêde li kobanê dem dema serhildanû bû. Di 19ê Tîrmehê de di ajansên cihanê şoreşa rojava derbasdibûn.
Gelê Rojavayê Kurdistanê di 19ê Tîrmeha sala 2012an de di nava şoreşê de şoreş kir û dest danî ser rêveberiyên bajaran.
Tevgera Kurd bi vê armancê stratejiyek ji sê qonaxan şopand; di qonaxa yekemîn de gund û qadên bejahî yên ser bi bajaran hatin desteserkirin, di qonaxa duyemîn de dest danîn ser saziyên sivîl û xizmetê yên ser bi dewletê ve. Û di qonaxa sêyemîn de jî dest danî ser tevahiya bajaran. Ew roj dawî li sîstem û rêveberiya rejîma Baas ya 100 salî danîn.
Ji Kobanê destpêkirin. Di 19ê Tîrmehê de li Kobanê bi beşdariya gel re, hêzên rejîmê ji bajêr hatin derxistin.
Kurdan bi 19ê Tîrmehê re, dest danîn ser rêveberiyê û ji siyasetê heta parastinê, ji edaletê heta çandê, ji qada civakî heta aborî û pirsgirêkên jinan, xwe veguherand sazîbûnê û dest bi avakirina pergala xwe ya bi navê "Xweseriya Demokratîk" kirin.
ÎROJ...
Piştî şoreşa rojava, kurd ji aliyêk ve bi rêxistin dibûn, saziyên xwe avadikirin û ji aliyek ve jî ji bo parastinê bi rêxistin dibûn. Bi navê DAÎŞ rêxistinek dijminê mirovahiyê musalatî serê kurdan kirin. Bi dewleta Tirkiyê re têkildar bûn. Li dijî wan şerek destpêkir. Û ev şer îroh jî li gelek deveran dewam dike. Lê ji bo şoreşa rojava talukeya herî xeter hewldanên dagirkeriya dewleta Tirkiyênin. Piştî dagirkirina Efrînê îrojî hewldidin ku şoreşa rojava bi temamî ji holê rakin.



# Em ê li ser rêya Ocalan bimeşin

***Endama Desteya Niştimanî ya Ereb Hiweyda El-Nedas tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û got, "Em weke jinên ji neteweya Ereb bi alikariya Rêveberiya xweser îro gihiştin vê astê. Jin îro bi saya Ocalan bi roleke mezin radibin. Em ê heta dawiyê li ser rêya Ocalan bimeşin."***



Endama Desteya Niştimanî ya Ereb Hiweyda El-Nedas tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û bang li hemû dewletên navneteweyî kir ku rewşa Rêberê Gelê Kurd Ocalan a tendirustî bişopînin û agahiyekê bidin raya giştî.
Endama Desteya Nîştîmanî ya Ereb Hiweyda El-Nedas di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Ev nêzî çend salane ku dewleta tirk tecrîda li ser Rêberê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dimeşîne û nahêle ku malbat û parêzerên wî biçin serdana wî. Heta ku agahiyên derbarê Ocalan de jî tên veşartin û nahêle ku gel fikir û felsefeya wî nas bikin."
Hiweyda, El-Nedas Endama Desteya Nîştîmanî ya Ereb a beşa Tendirustiyê wiha got: "Em weke jinên ji neteweya Ereb bi alikariya Rêveberiya xweser îro gîhan vê astê. Em tecrîda li ser Rêber Apo şermezar dikin û ez berxwedana Rêber Apo ya di zindanê de pîroz dikim. Ew berxwedana mezin ku li hemberî dewleta tirk pêş ket û bû mînaka serkeftina vîna azad ji me hemûyan re mînak e."
Hiweyda wiha berdewam kir: "Gelek zehmetî û êrîş li ser Rêber Apo hene, lê belê gelê kurd li ser fikir û felsefeya Rêber Apo dimeşe. Rêber Apo dixwaze ku gelê wî azad be, ji ber vê yekê têkoşînê dide. Heta ku gelê kurd li ser riya Rêberê xwe bimeşe wê xwe ji qetlîam û komkujiyan rizgar bike."
Hiweydayê diyar kir ku ew bang li hemû dewletên navneteweyî dike ku rewşa Abdullah Ocalan a tendirustiya wî diyar bibe û ji gelê wî re bê ragihandin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em ê soz bidin ku em ê li ser riya rêber Apo ku daye pêşiya me berdewam bikin û bimeşin. Bi riya fikir û felsefeya Rêber Apo rêvebertiya xweser hat îlankirin jinan di rêveberiya xweser de cihê xwe girtin û rolek mezin dilîzin."…*JINNEWS*

## Jin bi kedê berheman pêk tînin



Gulbîn BOZO

Li Rojava jin di her qadên jiyanê de bi keda xwe berheman pêk tînin. Jinên Dêrikê beşdarî hemû xebatan dibin û projeyên aboriya jinan ava dikin. Jina bi navê Nayla Hesen ku di firina jinan a li Dêrikê de dixebite derbarê projeyên aboriya jinan de axivî û got, "Ji bo pêşxistina aboriya xweser ya jinan pêşxistina projeyan girîng in."

### JIN BEŞDARÎ HEMÛ QADÊN JIYANÊ DIBIN

Yek ji berhemên projeya xweser ya aboriya jinan jî Firina Adar e. Jin di vê firinê de dixebitin û bi rêve dibin. Yek ji xebatkara firinê Nayla Hesen diyar kir ku Firina Adar ev du sale hatiye vekirin û wiha got, "Vekirina firina Adar ber bi pêşxistina aboriya xweser de gaveke girîng bû." Nayla da zanîn ku ew rojane ji sibê heta saetên piştî nîvro firinê dixebitînin.



Nayla wiha dewam kir, "Em weke rojane bi saetan li ser piyan dimînin. Ev xebateke zehmete lê em bi ked û xwîdana xwe kêfxweşin. Ji ber ku em bi keda didin hem xizmetê ji gel re dikin û hem jî debara mala xwe dikin."
Nayla Hesen di dawiyê de da zanîn ku armanca ji van projeyan ew e ku ji bo jinan derfetên xebatê were ava kirin û got, "Divê jin bi malê sînordar nemînin û beşdarî hemû xebatên civakê bibin. Di pêşxistina aboriyê de jî divê xwedî rol bin."

## Heta Efrîn rizgar bibe em ê têbikoşin



Piştî ku dewleta tirk û komên girêdayî wê êrîşî Efrînê kirin gelê li Efrînê ji bo ewlehiyê derbasî Şehbayê bû û li wir berxwedana xwe didomînin. Di encama êrîşan de gelek kes birîndar bûn, gelek kesî jiyana xwe ji dest dan û bi sedhezaran kes jî koçber bûn.
Ehmed Mihemed ê temenê wî 53 salî jî di encama êrîşên bombeyî de birîndar bû. Ehmed da zanîn ku wan heta dawî tevî malbata xwe têkoşîna xwe domandin û niha jî bi heman hêzê têkoşîna xwe didomînin.
Ehmed Mihemed, hevsera wî Hanîfe Êmo Menan û keça wî Bêrîvan Mihemmed anîn ziman ku wan serî li dijî êrîşên dewleta tirk û komên girêdayî wî netewandin û niha têkoşîna xwe didomînin.
Ehmed Mihemed da zanîn tevî ku birîndar bû jî ew heta dawî ji Efrînê derneketin û wiha got: "Di encama êrîşên hovane de em bûn şahidê mirina bi sedan kesan. Lê dîsa jî me heta dawî têkoşîna xwe dewam kir. Em ê ji niha şûnde jî bidomînin. Heta ku em Efrînê rizgar bikin em ê heta dawî têkoşîna xwe bidomînin."
Hevsera Ehmed Mohemed, Hanîfe Êmo ya 54 salî got: "Wekî hevserê min gelek kes bi vî rengî birîndar bûn, gelek kesan jî jiyana xwe ji dest dan. Êşa me mezin e lê em dîsa li dijî neyarên hov disekinin."
Keça Ehmed Mihemed jî wiha got: "Dema ku bavê min birîndar bû û me ew bir nexweşxaneya Avrînê ji qêrîna dayikan û zarokên birîndar deng nedihat bihîstin. Tevî zarokan gelek sîvîl hatin qetilkirin. Herî dawî dewleta tirk nexweşxaneya Avrînê jî bombebaran kir. Niha em wekî malbatî li Şehbayê li ber xwe didin. Me serî netewand û em serî natewînin."…*JINNEWS*

## Jinên Êzidî tecrîd şermezar kirin



Jinên Êzidî yên li Ermenîstanê dijîn, tecrîda li ser Ocalan şermezar kirin.
Jinên Kurd ên Êzidî yên li Ermenîstanê, ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Erîvanê daxuyaniyek dan çapemeniyê.
Bi navê jinên Êzidî yên li Ermenîstanê, Seroka Komîteya Kurdistanê Jînya Qadir axivî.
Jînya Qadir diyar kir ku dewleta Tirk bi rêya tecrîda li ser Ocalan dixwaze Tevgera Azadiyê ya Kurd û gelê Kurd teslîm bigire û got, "Divê em zanibin ku azadiya Kurdan bi azadiya Rêbertî dibe û li gorî vê yekê tevbigerin. Ji bo vê jî eger em rêxistinbûna xwe û karê xwe xurt bikin, em ê karibin Rêberê xwe azad bikin."

### DIVÊ TECRÎD QET JI BÎRA ME NEÇE

Jînya Qadir di dewama axaftina xwe de bang li saziyên navneteweyî kir ku ji bo azadiya Ocalan bikevin nava liv û tevgerê û got, "Wezîfeya me ya sereke ew e ku em ti carî tecrîdê ji bîr nekin, têbikoşin û bi erk û berpirsyariya xwe rabin."

## Meclîsa Jinan dewreya 4`emîn bi dawî kir



Akademiya Meclisa Jinên Sûriyê bi dirûşma "Jin bingeha avakirina civakê ne" dewreya perwerdeyê ya 4`emîn bi merasîmekê bi dawî kir.
Akademiya Meclisa Jinên Sûriyê bi dirûşma "Jin bingeha avakirina civakê ne" dewreya perwerdeyê ya 4`emîn li gundê Tişrîn ê Reqayê bi tevlêbûna 25 endamên saziyên sivîl, leşkerî, endamên Meclisa Herêma Cizîrê û Reqayê bi dawî kir. Dewreya perwerdeyê 25 rojan dewam kir. Di dewreyê de li ser mijarên cihêreng ders hatin dayîn.
Endamên Komîteya Jinên Sûriyê ya Reqayê, ciwanên Reqa û endamên Saziya Malbatên Şehîdan beşdarî merasîma bidawîkirina dewreyê bûn.
Yek ji rêveberên akademiyê Wefa El-Xelef di merasîmê de axivî û diyar kir jinên ku tev li dewreyê bûne gelek sûd ji perwerdeyê wergirtin û ev yek jî hêza wan li hemberî fikrên desthilatdar xurt dike.
Paşê ji rêvebera Komîteya Jinên Reqa û gundewarên wê Zelîxa Ebdê bidawîkirina dewreyê li hemû jinan pîroz kir û diyar kir ku armanca wan asta zanebûna jinê bilind bibe û jin xwe ji zilm û zora ku berê li ser wê dihat meşandin rizgar bike.
Zelîxa da zanîn ku jina perwerde kirî asta wê ya zanebûnê û rêxistinkirên zêdetir e û got, "jin bi rêya perwerdeyan dikare asta zanebûna xwe bilind bike."


# Rêber Apo planên qirkirinê têk bir

**Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû derbarê tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de axivî û diyar kir ku rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi avakirina PKK'ê re planên qirkirinê, planên tinekirina Kurdan ên dewleta Tirk ji hev xist. Ji ber vê yekê tolê ji Rêber Apo hiltînin."**

Karasû diyar kir ku rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi avakirina PKK'ê re planên qirkirinê, planên tinekirina Kurdan ên dewleta Tirk ji hev xist.

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû derbarê tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bersiv da pirsên rojnameya Yenî Ozgur Polîtîkayê.

Karasû diyar kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rêberekî ji rêzê yê siyasî nîne û got, "Rêber Apo ne tenê bernameyeke siyasî danî holê û qala azadiya Kurd û Kurdistanê kir. PKK jî ne tevgereke wiha ye. Rêber Apo zîhniyet, nêrîn, hestên Kurdan guherand; jiyan, rewşa malbatî û têkiliyên wan ên cîrantiyê guherand. Civakeke ku karibe têbikoşe derxist holê. Ji bo karibe di oxira azadî û demokrasiyê de têbikoşe, jiyana wan bi temamî guherand. Li dijî her şêweyên paşverûtiyê têkoşiya û gelê Kurd rakir ser piyan."



Karasû destnîşan kir ku bi têkoşîna Ocalan re rastiya Kurdên Azad afirî û wiha axivî: "Rastiya Kurdên Azad ên navenda xwe Amed e derkete holê. Rêber Apo got, "Rastiya Kurd a ku min afirand, rastiya Kurdên Azad ên navenda xwe Amed e". Ev bîst sal in ji ber vê yekê tecrîdeke giran li ser wî tê ferzkirin. Naxwazin gotineke wî jî bigihêje derve. Dibînin ku gotineke wî jî dikare bandorê li civakê bike. Lewma tecrîd û zexteke gelekî giran li ser wî heye."

### RÊBER APO PLANÊN QIRKIRINÊ JI HEV XIST

Karasû diyar kir, Ocalan rêberê gel e, rêberê şoreşê ye û bi hest û nêrînên xwe civakê bi rê ve dibe. Mûstafa Karasû anî ziman ku ji ber van taybetmendiyên xwe, dijminatiyeke mezin li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê kirin û wiha dewam kir: "Rêber Apo derkete holê, koma Apoyî ava kir, PKK damezrand û bi têkoşîneke mezin planên qirkirinê, planên tinekirina Kurdan ên dewleta Tirk ji hev xist, ji holê rakir. Lewma dijminatiyeke mezin li Rêbertî dikin. Ji ber ku mejî, polîtîka û têkoşîna vî Rêbertî bandor li Kurdên li hemû parçeyan kir. Rastiya dewleta Tirk, rastiya civaka Tirkiyeyê li pişt rastiya civakî û siyasî ya gelê Kurd maye. Ji ber vê yekê jî li dijî Rêber Apo bi hêrs in. Tolê ji Rêber Apo hiltînin."

### KIRYARÊN TAYBET ÊN LI DIJÎ ŞEXSEKÎ

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû diyar kir ku dewleta Tirk hemû derfetên xwe ji bo tinekirina têkoşîna 35 salan a bi pêşengiya PKK'ê bi kar tîne û got: "Hemû polîtîkayên xwe di vê çarçoveyê de ne. Dewleta ku li dijî têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd, li dijî têkoşîna azadiyê ya PKK'ê, li hemberî gerîla gelekî bi hêrs e û ji bo tinekirina wan hemû derfetên xwe bi kar tîne, bêguman wê tecrîd û zexteke giran li Rêber Apo bike, ku wî bi xwe ev têkoşîn afirand. Ev du sal in em nizanin bê hev dibînin a nabînin. Ji Tîrmeha 2011'an û vir ve heft sal in parêzer û malbat nikarin wî bibînin. Kiryareke bi vî rengî li cihekî din ê cîhanê nîne. Kiryarên taybet ku li dijî şexsekî bi cih tên anîn. Tenê li dijî Rêber Apo tên bikaranîn. Rêber Apo bîst sal in li dijî vê yekê li ber xwe dide."

### ŞERÊ TAYBET Û PSÎKOLOJÎK TÊ MEŞANDIN

Karasû destnîşan kir ku divê haya gel ji polîtîkayên li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hebe û got, "Çawa ku li derve li êrîş li dijî têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd tê kirin, zext û zordarî heye, li dijî Rêber Apo jî heman zext û êrîş hene. Tecrîda giran a li ser Rêber Apo ji ber vê yekê ye. Eger mirov dixwaze zexta li ser Rêber Apo fêhm bike, divê li zext û zordariya li gelê Kurd tê kirin binerin. Bîst sal in di her kêliyê de şerekî psîkolojîk li dijî Rêber Apo heye."

## Efrîn ne Bab û ne Îdlib e



**Idrîs HENAN**

Serkirdeyê Partiya Demokratîk a Kurd a Sûriyê PDKS Remzî Şêx Mûs derbarê Konferansa Rizgarkirina Efrînê de ji rojnameya Ronahî re axivî û ev tişt anî ziman: Lidarxistina konferansê gavek dîrokî bû. Ji bo pêkanîna biryarên konferansê em xwedî helwesteke stratejîk in. Gel û rêveberî wê pêkve Efrînê rizgar bikin. Efrîn ne Bab û Idlib e, ji bilî Efrîniyan kesek wê nikaribe Efrînê bi rê ve bibe.

### PÊWÎST BÛ HEMÛ ALÎ AMADE BÛNA

Remzî şêx Mûs serkirdeyê Partiya Demokrat a Kurd a Sûriyê PDKS li Efrînê derbarê Konferansa Rizgarkirina Efrînê de ji rojnameya Ronahî re ev nirxandin kir. Şêx Mûs şêwaz û mekanîzmeya lidarxistina konferansê bi serkeftî bi nav kir û got: Li gorî rêbazên rêxistinî yên lidarxistina konferansan, Konferansa Rizgarkirina Efrînê xwedî taybetmendiyek cuda bû. Mekanîzmeya platform, rexne û rexnedayîn min weke siyasetmedar cara yekê di vê konferansê de dît. Şêx Mûs dibêje ku nîqaşên di konferansê de hatine pêşxistin dîrokî bûn. Hemû kurt û kêmasî di 4 rojên konferansê de hatin nîqaşkirin û çareseriya guncaw bi encam û biryaran derket. Şêx Mûs dewam dike: Ji bona ku ev konferans hîna encamtir bûya, pêwîst dikir ku hemû partiyên Efrînê li ser navên xwe têde amade bûna. Ji ber ku ev konferansa Efrînê ye. Rizgarkirina Efrînê jî barê her Kurdistaniyekî û bi taybet Efrîniyan e.

### EM Ê BIRYARÊN KONFERANSÊ PÊK BÎNIN

Şêx Mûs derbarê civînên bi gel re tên lidarxistin de ev tişt anî ziman: Ji bona ku Rêveberiya Xweser û gel bibin yek ku em wan kêmasiyên xwe yên berê dubare nekin, gelekî girînge biryarên konferansê bi gel werin parvekirin. Ev gava han wê bêtir rêveberiyê bi civakê re bike yek û wê bi yek raman, fikirandin û helwestî pêkve ber bi rizgarkirina Efrînê ve biçin. Ji ber vê yekê di konferansê de xeta gel hate hilbijartin. Wê bi pratîzekirina encamên konferansê ne tenê Efrînê rizgar bibe, dê zihniyet jî were rizgarkirin.

Remzî Şêx Mûs berpirsê Partiya Demokrat a Kurd a Sûriyê PDKS li Efrînê tekez dike ku partiya wî di pêkanîna encam û biryarên konferansê de xwedî helwesta stratejîk e û dibêje: Em ê heya dawiyê wefedarê Berxwedana Efrînê û biryarên Konferansa Rizgarkirina Efrînê bin.

### EFRÎN BINGEHA ÇARESERIYA ALOZIYA SÛRIYÊ YE

Şêx Mûs di nav nirxandinên xwe de bal kişand ser tevgerîna aliyên dijber û got: Bi qasî têkoşîna me, aliyên ku dixwazin têkoşîna me têk bibin, gel û rêveberiyê ji hev qut bikin, dixebitin. Parvekirina biryar û encaman bi gel re, rê li ber hewldanên van aliyan digire û baweriya navbera gel û rêveberiyê de zêdetir dike. Civînên bi gel re isbat kirin ku gel û rêveberî li hemberî planan biryardarin Efrînê rizgar bikin. Wê li ser vê bingehê jî her keseke li cihê ku lê vê têkoşînê bimeşîne.

Serkirdeyê Partiya Demokratîk a Kurd a Sûriyê PDKS Remzî Şêx Mûs dawiya nirxandinên xwe de got ku konferans di çarîka dawî ya pêvajoya aloziya Sûriyê de hat lidarxistin. Tekez Efrîn ne Cerablus, Bab û Idlib e. Wê rizgarkirina Efrînê bibe bingeha çareserkirina tevahî aloziya Sûriyê. Ji bilî Efrîniyan kesek dîtir nikar Efrînê bi rê ve bibe.

## Divê Destûr Sûriyeke ne navendî armanc bike

Hevserokatiya MSD'ê di kongreya xwe ya sêyemîn de nêrîna xwe ya siyasî eşkere kir û pêşniyar kir ku aloziya Sûriyê bi sîstema nenavendî ya demokratîk, parastina yekbûna xaka Sûriyê, parastina ewlekarî û aramiya herêmê were bidawîkirin.


Sêyemîn Kongreya MSD'ê bi dirûşma "Ber bi çareserkirina siyasî û avakirina Sûriya nenavendî ya demokratîk ve" bi beşdarbûna 270 delegeyan, mêvanên ji tevahiya Sûriyê, her wiha şandeyên ji Ewropa û Misrê hat lidarxistin. Piştî axaftina hevserokatiyê hate kirin, nêrîna siyasî ya pêşeroja Sûriyê û çareserkirina aloziya Sûriyê û rêbaza çareseriyê hatin destnîşankirin.

Di bendên çareseriyê de wiha tê gotin:"Erêkirina projeya demokratîk a laîk wek projeya fikrî û siyasî ya pêşeroja Sûriyê, her wiha rêbaza çareserkirina pirsgirêka tayîfî ku di welat de pêk hatiye. Bi rêbaza demokratîk û laîk dê hemû kêşe û belayên li serê welat, bi dawî bibin. Demokrasî rêya çareserkirina kêşeyên neteweyî û mezhebî ye. Ev li welatê me ku bi pirrengiya xwe tê naskirin, heye. Tekezî li ser wê yekê were kirin ku çareserkirina aloziya Sûriyê li gorî rêbaza siyasî ku xwe wekî tekane rêya siyasî ku dikare guhertinan pêk bîne, dibe. Li gorî wê rê ji hemû pêkhateyan re were dayîn ku rola xwe di Sûriya pêşerojê de li ser esasê demokratîk pêk bînin. Ev ji bo avakirina civaka demokratîk a pirreng û saziyên dewleta destûrî ya nenavendî ye.

Tekezî li ser Sûriya ne navendî were kirin, ev ji bo pêkanîna rêgezên demokrasiyê û laîk ku divê destûrek demorkatîk a li ser esasê lihevkirinê pêk were. Destûra ku sîstema ne navendî ya pêşeroja Sûriyê armanc dike.

Tekezî li ser rêgezên MSD'ê û bingeha wê ya sereke ku wekî preojeya siyasî ya niştmanî ya demokratîk a hemû Sûriyê ye, were kirin. Ev proje ji bo hemû pêkhateyan û komên siyasî ji bo parastina berpirsiyariyên xwe û rizgarkirina niştiman li ser esasî demokratiyê û jiyana hevbeş pêk were. Di heman demê de rizgarkirina Sûriyê ji êşên heyî û pêkanîna hêviyên gel ên ber bi guhertina demokratîk pêk werin.

## Bo gotinên şaîr; Întîqam



**Qasim ENGÎN**

Dema ku em bi çend hevalan li ser navserên çiyayên welatê me dimeşiyan, di teyba dest ya hevalekî de helbesta Nûrî Dersîmî ÎNTÎQAM bi dengê wî bilind dibû.Nurî Dêrsîmî yek jî pêşengên berxwedana Dêrsîmê ye. Ji bo ku bikaribe plansaziya qirkirina dewleta Tirk a faşîst li ser Dêrsîmê bighîne cîhanê, ji aliyê Seyîd Riza de hatibû erkdarkirin. Dewleta Tirk a faşist 90 hezar Dersîmî qetil kiribûn. Di navbera salên 1925-1938 bi sedhezaran Kurd qetil kiribûn û Kurdistan dagir kirîbûn. Û ji bo kurdan gelek heqaret hatin kirin, di rojnameyên wê demê de, "Asî, di nav 5 rojan de hatin tinekirin. Yên li çemê Zeylanê bi temamî hatin tinekirin. Çemê Zeylanê bi sedan cenazeyan tijî ye..." hatibûn nivîsandin.

Helbesta Întîqam di demek wiha de hatibû nivîsandin. "Dîroka tê dîroka bêhesab a menkîbeyên lehengiyê ye. Ji ber ku tu zarokê neteweke ku 40 sedsale ji bo bikaribe bi namûs û azad bijî têdikoşe, û îro jî dest ji vê tekoşînê bernedaye...

Ji bo ku bikaribe hebûna xwe biparêze, kesayetiya xwe muhafaza bike, ti gelan wek me dem dirêj û bê navber şer nekiriye. Di dîroka me ya dirêj de ti hêz nekariye îtîrafa binketinê ji me re bide kirin.

Eniya Kurd wek navserên welatê me yê bilind, her tim bilind maye û li pêşiya ti fatîhan xwe netawandiye...

Ji ber ku Kurd qada mirin û mayînê ne terikandiye, îtîrafa windakirinê nekiriye, bîryar daye ku ji refên netewên cihanê de, ranebe û bijî. Û ji bo ku bijî, dizane ji bo azadiya xwe jî bimire...

Dîroka ti gelekî wek dîroka gelê me bi xwîn nebûye. Welatê ti gelekî wek welatê gelê me dagir nebûye. Ti netewan wek netewa me bê navber tekoşîn nekiriye. Di şert û mercên herî giran de jî, Kurdê bi çek, teslîm nebûye. Li hember hêzên mezin û hijmar zêde yên ku şer xwestine, Kurdan her tim erê gotiye.

Erê, hîkmeta hebûna me, berdewama jiyana me, di van gotinan de veşartiye...

Dema ku çavên xwişk û birayên me bi kuştinê dihatin girtin, ji çiyayên zimrûd ên Kurdistanê, zozanên tavîn hatin sirgûnkirin, li erdên bejî yên Anatolyayê ji birçîna mirin, bi nizeya dijminê qehpe, bi guleya wî hatin îmhakirin, gunehên wan tenê Kurdbûyîna wan bû...

Wesiyetek wan a amir û qehar ji bo te heye ku tenê peyvek e: ÎNTÎQAM!

Ez bi feryada bi hezaran bûk û keçên me ku ji bo namûs û şerefa te nekevin nav lingan, xwe ji tehtên asê, zinarên heybet ên welêt avêtin hembêza mirina xelaskar, bi ser te dinalim.

Ez bi feryada kûr a Kurdên kolekirî ku hê îro jî, li ber deriyê dijminên nemerd bi êsirtî dijî, her roj, her kêlî dilop bi dilop dimire, netew, ziman û nirxên wê tên biçûkkirin, bi ser te de digirîm...

Întîqam!

Ji bo pakkirina namûsa Kurd.

Întîqam!

Ji bo şakirina bi sed hezaran zarokên Kurd ên birçî hatina hêştin.

Întîqam!

Ji bo teskînkirina veqîrînên li asoyên Kurdistanê yên bûk û keçên me, yên avêtin gerinekan, di agiran de şewitandin.

Întîqam!

Ji bo pêkanîna armancên bi hezaran qurbaniyên welêt, di bin sêdarê de bi qehremanî silav dan mirinê û bi gotina 'Bijî Kurdistana Azad û Serbixwe!' taca şehadetê dan serê xwe.

Întîqam!

Ji bo ku em bikaribin hewtîna kuçikên ku di pişta qehpika bi navê medeniyetî xwe veşartî ne, bê deng bikin Întîqam..."

Erê, dem tam jî dema ku em ji bo bêdengkirina hewtîna kuçikan bêjin Întîqam û dakevin qada ne!



# Koma dawî ya YPG'ê ji Minbicê vekişiya

**Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ragihand, koma şêwirmend a dawî ya YPG'ê ya li Minbicê peywira xwe temam kiriye û roja 15'ê Tîrmehê bi temamî ji Minbicê vekişiyaye. Meclîsa Leşkerî ji bo piştgiriya wan spasiya YPG'ê û Koalîsyona Navdewletî kir.**



Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ragihand, koma şêwirmend a dawî ya YPG'ê ya li Minbicê peywira xwe temam kiriye û bi temamî ji Minbicê vekişiyaye. Fermandariya Giştî ya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê derbarê mijarê de daxuyanî da.

Di daxuyaniyê de ev tişt hatin gotin, "Meclîsa Leşkerî ya Minbicê radighîne ku beşa dawî ya şêwirmendên leşkerî yên YPG'ê piştî ku erka xwe ya perwerdekirina şervanan bi hevkariya koalîsyonê qedandin 15'ê Tîrmeha 2018'an ji Minbicê vekişiyan.

Piştî ku Meclîsa Leşkerî ya Minbicê di 4'ê Nîsana 2016'an de hate damezirandin û ji bo amadekariyên Pêngava Rizgarkirina Minbic û gundewarên wê ku di 1'ê Hezîrana 2016'an de destpê kir destek ji Yekîneyên Parastina Gel û Koalîsyona navdewletî xwest. Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û YPG'ê bi hevakariya Koalîsyona Navdewletî di 15'ê Tebaxa 2016'an de bajar rizgar kirin, piştî ku aramî li herêmê pêk hat, bi hezaran şênî vegeriyan bajarê xwe.

Di dîroka 16'ê Mijdara 2016'an de, wekî Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û rêveberiya ewlehî û leşkerî ya Minbicê girt. YPG' jî bi daxuyaniyeke fermî û merasîmeke leşkerî ji bajêr vekişiyaye. Lê me karê xwe yê avakirina saziyên û rêxistinkirina mekanîzmeya parastina bajar berdewam kir, me xwest ku komeke şêwirmendên leşkerî yên YPG'ê li Minbic bimînin da ku bi hevkariya Koalîsyona Navdewletî desteka perwerdekirina şervanên meclîsê bide. Piştî du salan meclîsê dît ku êdî ew dikarin bi xwe perwerdeyên xwe dewam bike. Li ser vê yekê û bi îtîfaqa YPG'ê beşek şêwirmendên leşkerî di 3'ê Hezîranê de vekişiyan, beşa dawî jî piştî ku karê xwe qedandin vekişiyan.Em wekî Meclîsa Leşkerî ya Minbicê, careke din spasiya YPG'ê û şêwirmendên leşkerî dikin ku piştgirî dane meclîsê. Her wiha em spasiya Hêzên Kaolîsyona Navdewletî dikin û berxwedana wan a rizgarkirina bajar ji terorê silav dikin."

## Divê em li ba kurdan li dijî faşîzmê têbikoşin



Ciwanên enternasyonalîst ên ku ji Spanya û Swîsreyê beşdarî çalakiya Mertalên Zîndî bûne, diyar kirin ku gelê Kurd ji bo mirovahiyê têkoşînê dike û gotin; "Em jî li dijî êrîşên dewleta Tirk li virin."

Çalakiya Mertalên Zîndî ya ji aliyê Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê ve li dijî dagirkeriya dewleta Tirk li Qendîlê hatî destpêkirin ji 8'ê Hezîranê ve didome û her roja ku diçe piştgiriya ji bo çalakiyê zêde dibe. Komek ciwanên enternasyonalîst ên ji Spanya û Swîsreyê ev çar roje çalakiyê berdewam dikin.

Ciwanê ji Siwîsre Tobyas Ryak li ser armanca hatina xwe axivî û wiha got, "Ji ber ku tevgera gelê Kurd mezintirîn şoreşa cîhanê ye, ez hatime Kurdistanê. Ez hatime çanda şoreşgerî ya gelê Kurd fêr bibim. Li gorî min şoreşa gelê Kurd yekane sîsteme ku li dijî kapîtalîzmê cihanê ber bi başiyê ve bibe. Gelê Kurd li dijî faşizm û sîstema kapîtalîzmê têdikoşin. Ji bo ku em jiyanek baştir ava bikin, divê em mil bi mil li gel Kurdan li dijî vê sistemê têbikoşin."

Ciwanê enternasyonalîst yê ji Spanyayê Avrî jî wiha got: "Li gorî min divê agahiya me ji tevahî mirovahiyê hebe, berî hemû tiştî jî, ji jin û zarokan. Divê em hewl bidin ji bo parastina mafê mirovan. Her çiqas ku li beramberî êrîşên dewleta Tirk piştgiriyek rasterast ji gelê Kurd nayê dayîn jî lê, em ji bo piştgirîya wan hatine vir."Guillermo Di Marco yê ji Spanyayê: "Tevî êrîşên berfireh ên li ser gelê Kurd jî, lê ticaran têkoşina gelê Kurd têkneçûye. Berxwedana wan hêvî dide mirovan. Dewleta Tirk topbaran û bombebarana vê xakê dike, li beramberî vê jî ciwanên Kurd parastina xaka xwe dikin û gav ber bi paşve na avêjin. Her çiqas tevgera gelê Kurd ji ya gelên Ewropa cudaye jî lê, em dikarin ji hevdu fêrî tiştên cuda binin."

Ciwanek din jî wiha got: "Em weke nûnerên ciwanên enternasyonalîst hatine vir. Em hatine li dijî êrîşên dagirkeriya Tirk piştgiriya niştecihên Qendîlê bikin. Her çiqas ku em li Swîsreyê dijîn lê, peywendiyên me qut nebûne û qut nabin. Bi taybet jî ez hest dikim ku nêzîkatiyek pir xurt ya me li gel tevgera gelê Kurd de heye. Ji ber ku ji bo azadiya jin û mirovahiyê têdikoşin. Ji ber vê çendê em ji bo piştgirîya wan hatine vir."

## Xwîna Welat wê li erdê nemîne



Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG'ê Fermandarê HPG'ê yê Eyaleta Xerzanê Welat Gever bi bîr anî, ji malbata wî û gelê Kurdistanê re sersaxî xwest.

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel bi bîr xist ku fermandarê gerîla Welat Gever li gelek herêman têkoşiya ye û ev peyam da:

"Li dijî şerê qirker û mêtinger ê TC'ê yê li Kurdistanê, weke tevger û gel em bi berdêlên giran li ber xwe didin. Ev berxwedana me gihîştiye asta topyekûn. Di vê demê de ku şerê qirkirinê yê li dijî gelê Kurd bi dijwarî dewam dike, tevgera me, gelê me û dostên me li hemû parçeyan û li deveyî welat di nava her şert û mercî de xwedî li têkoşîna azadiyê derdikevin û vê yekê weke çavkaniya mezin a hêvî û rizgariyê dibînin. Têkoşîna me ku roj bi roj bêhtir nêzî azadiyê dibe, bêguman bi saya şehîdên me yên leheng ku di vê oxirê de canê xwe feda kirin, dan pêş û tevlî karwanê nemiran bûn, gihîşte vê astê. Xwîna şehîdan a li her bihosta axa Kurdistanê rijiya ye, li wê derê jiyaneke nû û vejîn afirandiye. Gelê me yê Geverê ku bi şehîdên xwe yek ji kelehên berxwedan û welatparêziyê ye û di têkoşîna me de bi berdêlên xwe timî bûye xwedî roleke diyarker, fermandarekî xwe yê din ê leheng û bi rûmet hevrêyê me Welat Gever tevlî karwanê şehîdan kiriye.

### LI GELEK HERÊMAN FERMANDARÎ KIR

Hevrê Welat hîn di emrê ciwantî de, sala 1993'an tevlî nava refên Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê bû û demeke dirêj li gelek qadên şer bi fedakariyeke mezin bi erk û wezîfeya xwe rabû. Ji roja tevlî nava refên têkoşînê bû û heta roja dawî bû ewladekî hêja yê gelê xwe, şervan, fermandar, milîtan û hevrêyê partiya xwe. Ji başûr heta bakur, ji rojhilat heta rojava, ji Zagrosan heta Amed û Xerzanê li çar parçeyên Kurdistanê bû xwedî erkeke mezin û cihê xwe di dilê gel û hevrêyên xwe de girt. Hevrê Welat ku bi kesayetiya xwe ya partiyê, bi sekna xwe ya dilnizm û kedkariya xwe li pêş bû, wezîfeya xwe ya dawî ya Fermandariya Eyaleta Xerzanê jî bi sekna xwe ya pêşeng bi cih anî. Weke hevrêyên têkoşînê, weke nûnerên felsefeya ku 'dilsoziya bi şehîd re weke destpêka mirovbûnê dibîne', mîna hevrêyên xwe yên din ên şehîd em ê hevrêyê xwe Welat jî ji bîr nekin û soza xwe dubare dikin ku têkoşîneke bi heybet bikin ku wî jî tevlî karwanê nemiran bikin. Xwîna hevrêyê me Welat wê li erdê nemîne. Em sersaxiyê ji malbata hêja ya şehîdê xwe, ji gelê Geverê û tevahiya gelê Kurdistanê re dixwazin."

## 14'ê Tîrmeh'ê Rojiya Mirinê a Mezin



**Zekî BEDRAN**

Li ser 14'ê Tîrmehê Rojiya Mezin a Mirinê re 36 sal derbas bû. Di şert û mercên zehmet de ji berxwedanên herî mezin yê dîrokê bû. Ev berxwedana dîrokî bi serketina îradeya şoreşgerî bi encam bû.

Dewleta Tirk di şertên darbeyê de bi zêhniyet û nijadperestiyeke ku ji zincîrên xwe filitî bû êrîşî girtiyan kir. Zîndana Diyarbekirê bû hedefa sereke ya êrîşan. Civak hatibû tepisandin û hêzên muxalif hatibûn tune kirin. Li pêş wan ti astengî nemabû. Hêzeke siyasî ya mezin ku kadroyên pêşeng yên PKK'ê jî di navê de bûn tijî zîndana Diyarbekirê kiribûn. Hemû welat vegerîbû girtîgehê. Lê Kurdistan ji serî heta binî ji nûve dihat dagirkirin. Muxalefeteke şoreşger, ya herî girîng jî ji bo ku Kurdayetî careke din zindî nebe dixwestin bixin gorê. Ji bo pêwîstiya vê plana berfireh Diyarbekir weke herêma pîlot hat hilbijartin.

Dewleta Tirk bi rengekî layiqî navê xwe, di şidet û sûcên mirovahiyê de ku bê hevrike careke din nîşan da. Ti pîvanekî exlaqî, olî û hiqûqî nas nekir. Jiyan li girtiyên ku xistibûn nava çar dîwaran vegerandin cehenemê. Bi gotina wan "kesên girtî wê ji dayîkbûna xwe poşman bibûna." Li gel êşkenceyan, ji komkujiyên fizîkî zêdetir komkujiyên siyasî xistin meriyetê. Bi dehan mirovan ji ber êşkenceyan jiyana xwe ji dest dan. Qismek ji wan jî ji bo ku êşkenceyan rawestinîn û rûmeta mirovahiyê bilind bikin di rojiyên mirinê de û çalakiyên xwe şewitandinê de bê mirin bûn. Ya ku dixwestin, di şertên êşkence û wehşetê de mirov ji rûmetên xwe dûr bikevin, bibin hebûneke sivik û ji armanc û nasnameyên xwe dûr bikevin. Gelek hewldan kirin ku kursiyên dadgehê bibin dengê xiyanet û teslîmiyetê. Lê hemû lîstikên wan, amûrên wan yên şidetê di dawiyê de li hember îradeya şoreşgerî ya ji pola têk çûn. Di 21'ê Adarê 1982'an de Mazlûm Dogan jiyana xwe da ber namluyê û li ruyê faşîzmê xist. Di 18'ê Gulanê 1982'an de Ferhat Kurtay, Mehmûd Zengîn, Eşref Anyik û Necmî Oner bedena xwe xistin glokeke ji agir li dijî kiryarên faşîzmê yên tarî bûne meşaleyeke ronahiyê.

14'ê Tîrmhê Rojiya Mirinê ya Mezin jî li vê xeleka berxwedana dîrokî zêde bû. Rojiya mirinê bû lûtkeya berxwedanan. Bû darbeyeke mirinê ku li îtirafkariyê û xiyanetê ket. Dewlet di êrîşên şikandina îrade û bê nasname hiştina şoreşgeran de gelek bi biryar bû. Digot, "Min hûn xistin nava çar dîwaran. Min we ji cîhanê tecrîd kir. Kesek tune ye ku bê hawara we. Xwedayê vê alemê ezim, an hûnê bimirin an jî li ber min stuyê xwe xwar bikin." Di 14'ê Tîrmehê de li dadgehê Xeyrî Dûrmûş ragihand ku ew dest bi rojiya mirinê dike. Got, "Dibe ku hûn kujer û zalim bin. Dibe ku we hemû hêz bi dest xistibe. Dibe ku hûn weke fizîkî me bikujin lê hûn nikarin xwe bighînin ruh û îradeya me." Xeyrî bûbû manîfestoya îrade û têkneçûnê. Bedenên ku roj bi roj, saet bi saet heliyan û çûn mirinê îrade bilindkirin û bûne abideyên têkneçûnê. Armanca dîrokî ya dewletê ya ku xiyanetê bi ser bixîne di ber de hat hiştin. Berxwedan weke glokeke ronahiyê ket ser tarîtiya salên 12'ê Îlonê. Rêgezên mîlîtanî û sekna însanî careke din danîn holê. Li hember faşîzmê serkeftin çawa tê bidestxistin careke din hat nîşandan. Li ser vê berxwedana mezin re 36 sal derbas bû. Dema em vedigerin li pey xwe dinêrin em dibîn ku di zêhniyeta dewleta Tirk de ti guhertin çê nebûye. Erdogan cihê Kenan Evren girtiye. Girtîgeh dîsa tije ne. Dîsa binpêkirinên mafên mirovan û êşkence di rojevê de ne. Dîsa nijadperestî û faşîzm li pêş e.Faşîzma Tirk ya di pêşengiya Erdogan û Bahçelî de êrîşên xwe yên li ser hemû Kurdistanê berdewam dike. Bi dagirkirina Efrînê re paqijiya etnîkî dikin. Li dijî Kurdan bi hemû hêzên cîhanê re tifaqan dikin. Mîna dema 12'ê Îlonê armanca wan berçiqandin û şikandina îradeya Kurdane û dîxwazin Kurdan bixin bin tarîtiya dîrokê. Zihniyeta cîhana wan ya nexweş ku hebûna gelê Kurd ji bo xwe weke xetere dibînin neguheriye. Faşîzma 12'ê Îlonê li hember îradeya Xeyrî û Kemal têk çû. Hat îspatkirin ku îradeya mirovên xwedî bawerî û xwedî armanc têk naçe. Îro jî wezîfeya dîrokî ya têkbirin û şikandina îradeya faşîızmê li pêş me ye. Divê xwesteka faşîzmê di ber de bê hiştin û divê destûr neyê dayîn ku êdî êşê bi gelan û herêmê bidin kişandin. 14'ê Tîrmehê îro jî çavkaniya me ya hêzê ye. Buyereke derbasbuyî nîne. Hê jî rê nîşanî me dide.